# Bultena heftane

# 7/10/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار


Youtube: kongra.star22@gmail.com

## [Kedkarên Çapemeniyê yên Jin ên Ewropayê MKG pîroz kirin]

NAVENDA NÛÇEYAN - Kedkarên Çapmeniyê yên Jin yên Ewropayê ji bo MKG ya ku hat vekirin kulîk û peyamek şandin û serkeftin xwestin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219065

Çavkanî:JINNEWS



## Xelata Rûmetê ya Konseya Ewropayê dan Feleknas Ûca

Feleknas Ûca ya Xelata Rûmetê ya Konseya Ewropayê girt xelata xwe diyarî jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Şengalê li ber xwe didin, kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xelata-rumete-ya-konseya-ewropaye-dan-feleknas-Uca-41374

Çavkanî:JINHA



# Jinên Ereb yên Şengalê êrişan şermezar kirin

Meclisa Jinên Ereb ya Şengalê li dijî êrişên dewleta Tirk yê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de piştevaniya xwe ya bi gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê anîn ziman.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ereb-yen-Sengale-erisan-sermezar-kirin-41272

Çavkanî:JINHA



# Walîtiya Enqereyê Meşa Jinan a Cîhanê qedexe kir

Meşa Jinan a Cîhanê ya ku tê plankirin di 8'ê Cotmehê de li Qada Tandogan a Enqereyê bê lidarxistin, ji aliyê Walîtiya Enqereyê ve hat qedexekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/walitiya-enqereye-mesa-jinan-a-cihane-qedexe-kir-41273

Çavkanî:JINHA




## [Di Roja Rojnamegerên Jin ên Kurd de qedexeya gihandina JINNEWS](https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-roja-rojnamegeren-jin-en-kurd-de-qedexeya-gihandina-jinnews-41276)

Înternetê Vodafone Net bi biryara BTK’ê ketina JINNEWS’ê qedexe kir. Qedexe ku di 7’ê Cotmehê Roja Rojnamegerên Jin ên Kurd de hatiye kirin, bal kişand.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-roja-rojnamegeren-jin-en-kurd-de-qedexeya-gihandina-jinnews-41276

Çavkanî:JINHA




## [Kampanyaya Fazaa Hawa ji bo jin û zarokên ku ji lêhiyê bandor bûne dixebite](https://jinhaagency.com/ku/rojane/kampanyaya-fazaa-hawa-ji-bo-jin-u-zaroken-ku-ji-lehiye-bandor-bune-dixebite-41278)

Kampanyaya Alîkariyê ya Fazaa Hawa ya ku ji bo peydakirina pêdiviyên jin û zarokên ku ji ber lêhiya li Lîbyayê mexdûr bûne hat destpêkirin, xebatên xwe bi xurtî didomîne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kampanyaya-fazaa-hawa-ji-bo-jin-u-zaroken-ku-ji-lehiye-bandor-bune-dixebite-41278

Çavkani:JINHA



## Talîban zorê dide jin û zarokan ku bizewicin

Şukriya Nasim a ku ji ber zextên Talîbanê yên li Afganîstanê di temenekî biçûk de hat zewicandin, diyar kir ku wê di kursên ku li malê hatine vekirin de perwerdeya xwe berdewam dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/taliban-bi-dare-zore-jin-u-zarokan-dide-bizewicin-41284

Çavkanî:JINHA



## Jinên Mexrîbê ji bo erdehjezedeyan jiyanek mirovane dixwazin

Di erdheja ku li Mexrîbê rûdayî de 2 hezar û 946 kesan jiyana xwe ji dest dan. Ên ku mane jî di şert û mercên zehmet de hewl didin di jiyanê de bimînin. Saziyên ku ji bo jin û zarokan ketin tevgerê, bang ku jiyanek mirovane ji bo erdhejzedeyan were avakir

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexribe-ji-bo-erdehjezedeyan-jiyanek-mirovane-dixwazin-41281

Çavkanî:JINHA



# [Komxebata Di Rêveberiyên Herêmî de Polîtîkayên Jinê hat lidarxistin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/komxebata-di-reveberiyen-heremi-de-politikayen-jine-hat-lidarxistin-41282)

Komxebata “Di Rêveberiyên Herêmî de Polîtîkayên Jinê” ku ji aliyê Meclîsa Jinê ya HDP û Partiya Çep a Kesk ve tê organîzekirin dest pê kir. Jinan di axaftin û pêşkêşiyên xwe de gotin “hevserokatî û temsîliyeta wekhev xeta me ya binefşî ye’.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/komxebata-di-reveberiyen-heremi-de-politikayen-jine-hat-lidarxistin-41282

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Suweyda heta daxwazên wan neyên bicih anîn wê li qadan bin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suweyda-heta-daxwazen-wan-neyen-bicih-anin-we-li-qadan-bin-41285)

Xwepêşandanên Jinên Suweyda ku ev dû mehe berdewam dike, ji bo rêveberiyek demokratîk, ji holê rakirina gendeliyê, baş kirina şert û mercên jiyanê û ji bo jiyanek azad banga berdewamkirina têkoşînê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-suweyda-heta-daxwazen-wan-neyen-bicih-anin-we-li-qadan-bin-41285

Çavkanî:JINHA



## Komeleya Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê hat vekirin

Rojnamevanên ku Komaleya Rojnamevanên Jin ên Mezopotamyayê vekirin gotin: “Em ê bi helwest û felsefeya xwe ya li Kurdistanê îlhamê bidin jinên cîhanê" û diyar kirin ku dê Gurbetellî Ersoz bibe seroka daîmî ya komeleyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/komeleya-rojnamegeren-jin-a-mezopotamyaye-hat-vekirin-41288

Çavkanî:JINHA




## Di meha îlonê de 32 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN- Li gorî çeteleya tundiyê ya meha îlonê ya ajansa me  32 jin û 3 zarok hatin qetilkirin, 22 jin û zarokekan jî bi guman jiyana xwe ji dest dane û jinek jî bi hewldana qetilkirinê re hatiye rû hev.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219014

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Heta ku jiyana em dixwazin bi dest nexin divê em paşde gav neavêjin’

Jinên ku li Suweydayê protestoya xwe didomînin, peyama “Heta ku jiyana em dixwazin bi dest nexin divê em paşde gav neavêjin” dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/heta-ku-jiyana-em-dixwazin-bi-dest-nexin-dive-em-pasde-gav-neavejin-41311

Çavkanî:JINHA




## ‘Wek jinekê bi xebata xwe serbilind im’

AMED - Mevlîde Gedîzmenler, bi hevjîn û du zarokên xwe re ji bo li kolanan cil û bergan nefiroşe, li Baglar a Amedê dukanek cilan vekir û bi vê dukanê debara xwe dike.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219078

Çavkanî:JINNEWS



## [‘Yek ji astengiyên li pêşiya tevgera jinan komên îslama radîkal in’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/yek-ji-astengiyen-li-pesiya-tevgera-jinan-komen-islama-radikal-in-41320)

Jinên ji Meşa Jinan a Cîhanê, bal kişandin ku partiyên netewperest û nijadperest li tevahiya cîhanê û bi taybetî li Ewropayê bi hêz dibin û diyar kirin ku îslama radîkal yek ji astengiyên girîng ên li pêşiya tevgera jinan a li cîhan û Rojhilata Navîn e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/yek-ji-astengiyen-li-pesiya-tevgera-jinan-komen-islama-radikal-in-41320

Çavkanî:JINHA




## ['Qanûn nahêlin jin mafên xwe bi dest bixin'](https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/qanun-nahelin-jin-mafen-xwe-bi-dest-bixin-41322)

Parêzer Rûla Mûsa diyar kir ku tevî ku di warê destekkirina mafên jinan de pêşketin çêbûne jî, astengiyên di qanûnê de cîbicîkirina mafên xwe zehmet dike û got: "Zagon rê nade jin mafên xwe bi dest bixin."

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/qanun-nahelin-jin-mafen-xwe-bi-dest-bixin-41322

Çavkanî:JINHA



# RJAK: Bi hêza jinên şoreşger em ê Rêber Apo bi fizîkî azad bikin

Rêxistina jinên Azad a Kurdistanê RJAK û jinên Kerkukê bi boneya salvegera komploya navneteweyî ya 9’ê Cotmehê daxuyaniyek nivîskî weşand û diyar kir ku komploya navneteweyî ne tenê li ser Rêber Apo bû, heta niha jî li ser tevayî jinan berdewam dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rjak-bi-heza-jinen-soresger-em-e-reber-apo-bi-fiziki-azad-bikin-41324

Çavkanî:JINHA




# Der barê jinên ku tacîza çawişê pispor şermezar kirin de lêpirsîn

Li Wanê der barê 8 jinên ku tacîza çawişê pispor protesto kirin de bi îdeaya ‘xelkê teşwîqî kîndarî û dijminahiyê dikin’ lêpirsîn hat destpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/der-bare-jinen-ku-taciza-cawise-pispor-sermezar-kirin-de-lepirsin-41325

Çavkanî:JINHA



# Jinên girtî ên siyasî ji bo Rojava bang kirin

Jinên li girtîgeha girtî ya Sîncan a Jinan a Enqere diyarkirin ku dewleta Tirk hedefgirtina qadên jiyanê ên Rojavayê Kurdistanê 'hewildane qirkirinê ye' banga ketina tevgerê li rêxistinên civaka sivîl, hêzên demokrat û gelan kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-girtiyen-siyasi-banga-ji-bo-rojava-bikeve-tevgere-41331

Çavkanî:JINHA




# Bi roman û çîrokên xwe jiyana dijwar a jinên ciwan vedibêje

Nivîskar Rabab Kassab ku di pirtûkên xwe de astengiyên jinên ciwan ên dûrî navendên bajaran dijîn vedibêje, diyar kir ku li gundan bi hincetên cuda mafên jinên ciwan tên desteserkirin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-roman-u-ciroken-xwe-jiyana-dijwar-a-jinen-ciwan-vedibeje-41352

Çavkanî:JINHA



## [Li Cezayîrê li dijî tundiya li ser jin û zarokên xwedî pêdiviyên taybet xebat]

Li Cezayîrê bi projeya "Maf, Rêzgirtin û Wekheviya Ji bo Jinên xwedî Pêdiviyên Taybet" dê bi balkişandina li ser tundiya li ser jin û keçên xwedî pêdiviyên taybet li malê, malbatê, li kolanan, çalakiyên hişyariyê bên lidarxistin. Li Cezayîrê bi projeya "M

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-cezayire-li-diji-tundiya-li-diji-jin-u-zaroken-xwedi-pediviyen-taybet-xebat-41353

Çavkanî:JINHA



## [Zarîfe Ebû Kura ya Fîlîstînî: Jin li hewşa Mescid-i Aksa rastî îşkenceyan tên]

Aktîvîsta Fîlîstînî Zarîfa Ebu Kura diyar kir ku di erîşan de jin û zarok tên qetilkirin û got: “Jinên El Halîlê her roj di noqteyên kontrole de li hewşa Mescid-i Aksayê rastî îşkenceyên giran tên.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zarife-ebu-kura-ya-filistini-jin-li-hewsa-mescid-i-aksa-rasti-iskenceyan-ten-41354

Çavkanî:JINHA



# Cîgira Hevserokên Giştî yên DBP’ê hate girtin

Cîgira Hevserokên Giştî yên DBP’ê Zekiye Îlbasan li Amedê di protestoyên komploya 9’’ Cotmehê bi îdeaya ‘Li dijî polîsan li ber xwe daye’ hate girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/cigira-hevseroken-gisti-yen-dbp-e-hate-girtin-41359

Çavkanî:JINHA




# Li endama KJAR’ê Werîşe Muradî îşkence

WAN - Rêxistina Mafê Mirovan a Hengaw diyar kir ku li endama KJAR’ê Werîşe Muradî ku 70 rojin li navenda binçavkirinê ya Sanandaj girtiye îşkence hatiye kirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219280

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên tacîza çawişên pispor protesto kirin îfade dan

WAN - Der barê jinên di protestokirina tacîza çawişên pispor de pankart hilgirtin de lêpirsîn hatibû destpêkirin. Jinan, li emniyetê îfade dan.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219271

Çavkanî:JINNEWS




## 'Divê li dijî tacîza polîs û leşkeran jin xwe biparêzin'

ÎZMÎR - Jinên ku bertek nîşanî tacîzkirina 2 jinan a ji aliyê 6 çawîşên pispor ve li Wanê hat kirin dan, bal kişandin ser şerê taybet û polîtîkayên bêcezakirinê. Jinan diyar kirin ku li dijî parastina polîs û leşkeran a ji aliyê îqtîdarê ve divê jin parastina xwe bikin û xwe rêxitin bikin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219222

Çavkanî:JINNEWS



## Di bidarvekirina jinan de dewleta Îranê yekemîn e

Li gorî Komîteya Jinan a Meclisa Nîştimanî ya Berxwedanê ya Îranê, dewleta Îranê di sûcên darvekirinê yên li dijî muxalîfan de, bi taybet li dijî jinan, di rêza yekemîn de ye.

https://hawarnews.com/kr/haber/di-bidarvekirina-jinan-de-dewleta-ran-yekemn-e-h79668.html

Çavkanî:ANHA



## Li Mêrdînê cerdevanek jinekî qetil kir

Li gundê Xirbetawê yê Mehsertê yê Mêrdînê Zehra Yildirim ji aliyê mêrê cerdevan ê pê re zewicî bû, hat qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-merdine-cerdevanek-jineki-qetil-kir-41380

Çavkanî.JINHA



## Daxwaza rawestandina darizandina parlamenter Halîde Turkoglu hat redkirin

Dadgehê daxwaza rawestandina doza ku parlamentera Partiya Çepên Kesk a Amedê Halîde Turkoglu jê tê darizandin red kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/daxwaza-rawestandina-darizandina-parlamenter-halide-turkoglu-hat-redkirin-41378

Çavkanî:JINHA



## Aktivîsta Filistiînê: Ambulansa ku çû hewara birîndaran bû hedef

Aktivîsta mafên mirovan Hanadî Abed diyar kir ku ambulansa ku xwest biçe hewara birîndarên ku li taxên Xezayê yên tên bombekirin û wesayîdên ku xwarinê ji bo gel dibirin ji aliyê Îsraîlê ve hatine hedefgirtin û destnîşan kir ku Îsrail sûcên şer dike

https://jinhaagency.com/ku/rojane/aktivista-filistiine-ambulansa-ku-cu-hewara-birindaran-bu-hedef-41376

Çavkanî:JINHA



## Rojnamevan Nazîla Marûfiyan li Silêmaniyê di bin êşkenceyê de ma

Rojnameger Nazîla Marofiyan ku 4 caran ji ber hevpeyvîna bi bavê Jîna Emînî re hat girtin, ragihand ku ji ber zextên lê dihat kirin derbasî bajarê Silêmaniyê bûbû, êşkence lê hatiye kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevan-nazila-marufiyan-li-silemaniye-di-bin-eskence-de-ma-41370

Çakanî:JINHA



## 'Felsefeya Jin Jiyan Azadî riya bi dawî anîna tewanên li dijî jinan e'

Çalakvana Geşe Dara ya bal kişand li ser tundî û qetilkirina jinan anî ziman ku di bûyerên qetilkirina jinan de mafên jinan tên binpêkirin û kiryar tên parastin û got "Felsefeya Jin Jiyan Azadî riya bi dawî anîna tewanên li dijî jinan e."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/felsefeya-jin-jiyan-azadi-riya-bi-dawi-anina-tewanen-li-diji-jinan-e-41368

Çavkanî:JINHA



## Li Artvînê tundiya mêr: Du jin hatin qetilkirin

ARTVÎN - Li navçeya Şaşvat a Artvînê mêrê bi navê S.Y, Hukmiye Çîmen û Leyla Yilmaz bi çekê qetil kir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/219345

Çavkanî.JINNEWS




## MKGP: Di 3 mehan de 10 rojnamegerên jin hatin binçavkirin

Di rapora binpêkirina mafan a ji aliyê MKGP'ê ve li hemberî rojnamegerên jin hat amadekirin de, hat diyarkirin ku di 3 mehan de 10 rojnameger hatine binçavkirin û 5 rojnameger jî rastî îşkenceyê hatine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mkgp-di-3-mehan-de-10-rojnamegeren-jin-hatin-bincavkirin-41399

Çavkanî:JINHA



# Xwendekaran li Helebceyê çalakî li dar xistin

Xwendekarên pola 12’an a amadeyî li Baxê Giştî yê bajarê Helebceyê, çalakî li dar xistin. Xwendekaran daxwaz kirin ku mafên mamosteyan bên dayîn û deriyê dibistanan werin vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwendekaran-li-helebceye-calaki-li-dar-xistin-41397

Çavkanî:JINHA



# Rozerîn Kemanger: Navenda êrîşan Îmrali ye

Berpirsa Pêwendiyên Karên derve ya Komeleya Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistan (KJAR) Rozerîn Kemanger bal kişand ser êrişên li ser Kurdistanê, anî ziman ku êriş ji polîtîkayên komplo û tecrîdê ne qût in û got “Navenda êrişan Îmrali ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rozerin-kemanger-navenda-erisan-Imrali-ye-41386

Çavkanî:JINHA



# [‘Armanca dewleta Tirk tunekirina hemû Kurdan e’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/armanca-dewleta-tirk-tunekirina-hemu-kurdan-e-41406)

Dewleta Tirk di her fersendê de êrîşî Bakur û rojhilatê Sûriyeyê dike, hewl dide çand û neteweya Kurd tune bike. Çalakvan û rojnamevanên li başûrê Kurdistanê daxwaz kirin ku gelê Başûr şiyar be û ji bo parastina xaka Kurdistanê derbikevin qadan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/armanca-dewleta-tirk-tunekirina-hemu-kurdan-e-41406

Çavkanî:JINHA



# [Bi çîrokên xwe hewl dide hişmendiya civakî bilind bike](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-ciroken-xwe-hewl-dide-hismendiya-civaki-bilind-bike-41407)

Nivîskar û çîrokbêja Misrî Rania Hilal vegerandina xalên zagonê bi zimanek ê rojane çîrokên jinan vedibêje kir pirtuk, hedef dike ku derbarê mafê jinan de hişmendiya civakî bilind bike.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-ciroken-xwe-hewl-dide-hismendiya-civaki-bilind-bike-41407

Çavkanî:JINHA



# Dewleta Tirk li Eyn Îsayê jinek qetil kir

Di topbarana dewleta Tirk a li ser gundê Xalidiyê de ku dikeve rojavayê Eyn Îsa de Emşa Hilal el-Begar a 65 salî hat qetilkirin, welatiyê bi navê Mihemed el-Xelef el-Elî 70 salî jî birîndar bû.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dewleta-tirk-li-eyn-Isaye-jinek-qetil-kir-41289

Çavkanî:JINHA



# Dewleta Tirk jinên karker hedef girt: 4 jin û zarokek birîndar bûn

Dewleta Tirk gundê Bişêriyê a navçeya Zirganê ya girêdayî bajarê Dirbêsiyê topbaran kir, di encamê de zarokek û 4 karkerên jin ên ku pembo diçînin birîndar bûn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dewleta-tirk-jinen-ku-pembu-dicinin-hedef-girt-4-jin-u-zarokek-birindar-bun-41326

Çavkanî:JINHA



## [Li Serêkaniyê a dagirkirî 2 jin hatin qetilkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-serekaniye-a-dagirkiri-2-jin-hatin-qetilkirin-41330)

Jinên bi navê Zehra Şihada û Şehed Şihada li Serêkaniyê a dagirkirî piştî îşkence û tundiyê ji aliyê birayên xwe ve bi awayekî hovane hatin qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-serekaniye-a-dagirkiri-2-jin-hatin-qetilkirin-41330

Çavkanî:JINHA



## 8 rêxistinên jinan dijî êrişên dagirkeriyê name ji NY'ê re şand

Li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagiker ên li ser Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê, 8 rêxistinên jinan nameyeke hevbeş ji Sekreteyê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) António Guterres û saziyên NY'ê re şandin.

https://hawarnews.com/kr/haber/8-rxistinn-jinan-dij-risn-dagirkeriy-name-ji-ny-re-sand-h79575.html

Çavkanî:ANHA




رسالة مفتوحة إلى الأمم المتحدة
إلى الأمين العام السيد أنطونيو غوتيريش
إلى المفوض السامي لحقوق الإنسان، السيد فولكر تورك
إلى اللجنة المعنية بحقوق الإنسان ومجلس حقوق الإنسان ورئيسه السيد فاتسلاف باليك
إلى الجمعية العامة ورئيسها السيد دينيس فرانسيس
إلى مجلس الأمن

## Li Serêkaniyê jinek hat qetilkirin

Li Serêkaniya ku ji aliyê dewleta Tirk û komên çete yên paramîlîter ên girêdayî dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin, jinek ciwan hat qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-serekaniye-jinek-hat-qetilkirin-41390

Çavkanî:JINHA



## Li dijî pênceşêra pêsîrê mal bi mal semîner tê dayîn

Bi armanca hişyariya di warê tenduristî û piştgiriya derûnî, Heyva Sor a Kurd li navçeya Til Temirê ji bo jinan di tevgerê de ye.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/li-diji-pencesera-pesire-mal-bi-mal-seminer-te-dayin-41402

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

14.10.2023